

TU BI XÊR HATIYÎ KITÊBXANEYÊ

Kurmanji

Destûra her kesî heye ku were kitêbxaneyê.

Hatina kitêbxaneyê belaş e.

Bi karta kitêbxaneyê tu dikarî kitêban deyn
bikî û komputer û înternetê bi kar bînî.

Her kes dikare karta kitêbxaneyê bistîne.

Kitêb û rojname yên bi zimanên cuda
û ji hemû cîhanê li kitêbxaneyê hene.



Wan li kitêbxaneyê bixwîne yan bi
deyn bibe malê. Ew belaş e.

Fîlm, lîstik û sêlik hene.

Li kitêbxaneyê tu dikarî komputer û
înternetê bi kar bînî. WiFi-ya belaş heye.

Li kitêbxaneyê tu dikarî tiştan çap bikî, kopiyê bikî û skaner bikî.

Kitêbên zarokan yê bi zimanên cuda hene.



Ode ji bo deynkirinê hene.

Kitêbxane bi piranî bêdeng e. Dibe ku tu bîstikekê li vir rûnî.

TU WEHA KARTA KITÊBXANEYÊ DISTÎNÎ

1. Were kitêbxaneyê û li gel karmendan biaxive.
2. Nasnameya xwe nîşan bide. Heger nasnameya te tune be jî, tu dikarî karta kitêbxaneyê bistînî. Hingê ew kart ji bo sê mehan e.
3. Şîfreyeka pin-ê (çar reqem) bibijêre.

Karta xwe ya kitêbxaneyê bi xwe re bîne gava tu serdana kitêbxaneyê dikî.



Tu dikarî tiştê ku tu ji kitêbxaneyê deyn dikî yek, du yan çar hefteyan li bal xwe bihêlî. Tu dikarî gelek tiştan ji wan cardî deyn bikî.

Giring e ku tu wî tiştî yê ku tu deyn dikî di wext de vegerîni. Bervajî wê, dibe ku divê tu heqekî bidî. Karta te ya kitêbxaneyê jî dikare bê îptal kirin.



Tu wesilekê/meqbûzekê werdigirî gava tu tiştêkî deyn dikî. Tê de tê nivîsîn ka tu herî dereng di kîjan tarîxê de tiştê ku te deyn kiriye vegerîni.

Em yê ku li kitêbxaneyê kar dikin bi kêfxweşî bersiva pirsan didin.



Kitêbxaneyên me xwedî malperek e ku navê wê ev e Minabibliotek.se. Piraniya tiştên ku tê de hatine nivîsîn bi zimanê swêdî ne.

Tu dikarî ji bo cardî-deynkirina tiştên ku te birine malê, sparişkirina kitêban yan deynkirina kitêbên elektronîk hesabekê di Minabibliotek.se de vekî. Em bi kêfxweşî alîkariyê dikin heger tu bixwazî.

KARTA KITÊBXANEYÊ BI KÊRÎ VAN KITÊBXANEYAN TÊ

BJURHOLM

Kitêbxaneya Bjurholmê

NORDMALING

Kitêbxaneya Nordmalingê
Stasiyona kitêban ya
Rundvikê

ROBERTSFORS

Kitêbxaneya Bygdeåyê
Kitêbxaneya Robertsforsê
Kitêbxaneya Änäsetê

UMEÅ

Otobusa kitêban
Kitêbxaneya Ersbodayê
Kitêbxaneya Grubbeyê
Kitêbxaneya Holmsundê
Kitêbxaneya Hörneforsê

Kitêbxaneya Mariehemê
Kitêbxaneya Obbolayê
Kitêbxaneya Sävarê
Kitêbxaneya bajarê
Umeåyê
Kitêbxaneya Tegê
Kitêbxaneya Umedalenê
Kitêbxaneya Ålidhemê

VINDELN

Kitêbxaneya Vindelne
Kitêbxaneya Granöyê
Kitêbxaneya Hällnäsê
Kitêbxaneya Tvärålundê
Kitêbxaneya Åmseleyê

VÄNNÄS

Kitêbxaneya Vännäsê
Kitêbxaneya Vännäsbyê

Kitêbxaneya herî nêzîk ji bo min:

